Welatê Xwe Nas Bike



Berhevkirin: Arezo

Bîrecûk,

bajareki bi 40 hezar nufusa xwe li xwe gerexê çemê Ferat'e. Nêzîkî tixûbê sûrîya ev roje. Ji yekemîn dewra ewel û heya 50 sal berê ciyekî xwey taybethebû, ji berk o li ser rêya Anatolîa yêbû. Ev bajar yek ji bajarê ku Anatolîayê û Mezopotamya yê bi hevre girêdida. Di 1956 ande pirekî bi dirêjahîya 720 metre li ser Ferâte avakirin. Ev pir bajare Riha û Dîlokê bi hevre girêdidê.

Îro qezayek geşe. Ragihandina mabeyna rojhilat û dîrokîye. Mixabin avahîyên dîrokî hatine xerabkirin.

Bîrecûk bajareki bi dar û daristane. Ji ber Feratê mezin, y abi heybet û şîn û bereket dinavde derbas dibe, xweşayî û jiyanek zindi têde heye. Kûrahîya çem3e Ferat li Bîrecûk'ê zêde xwe nîşandide.

Li ber çem gelek baxçe û parkên bîhnvedane hene. Bi vî renji herkes tê westandina xwe ji ser xwe davêjê û temaşa Ferat û rengîn dike. şaredarîya bajêr bi hes^b ko bajêr hem dîrokîye û hemji li deverek giringe, dixwaze xizmetên baş bike û dikeji.

KANIYA HEKÎMÎ:

Kanîya Hekîmî ava wê ji nav zinarên serîya bajêr tê. Tê gotin ku jibo gelek nexweşînên şîfaye. Her wekî kevirên gurçikan, nexweşînên çermî û mîdê. Zor insan tên ser vê avê da nesaxîyên xwe çareser bikin.

TEYRÊN KEÇEL:

Bajêr bi newekî teyranjî bi nav û denge. Evan teyrên han Bîrecûk'ê kirinê hêlîn û lîsê xwe. Di seranserî dinyayêda zêde kêmin. Ji bo zêdebûna nesla wan warekî taybetî ji wanre hatiye amadekirin.

Evan teyrên keçel di mangî sibat sa tên vî warî. Têjikê xwe derdixin, di van lîsên di zinarada dilîsin. Di nîvê temmuzê da yanî meha heftande tevî têjikên xwe berbi başûrva koç dikin. Koça wan bo behra sor, Sûdan û Nîla jorîye. Her sal binavê wanj3i festiwalek t3e amadekirin.

Her sal bo seredana wan 7000 însan têne bajêr.

DERÊ KELÊ:

Derîkî mezin û bi kember hey eko diçe kela Bîrecûk'ê. Ev derî ji keviran hatîye avakirin û kemerên we zor mezinin. şiklê keberê hîlaliye. Avekî ji nav kelê tê xwar. Lê ev av tê nava xanîkî. Ciha avê taybete, lê mixabin zêde xerabeye. Ji kelêji çi behrem nemane xerab bûye.

XALFETÎ :

Xalafetî qezayek bajarê Rihayê ye. Li ser xetta kenarê Ferat'e. Ji Bîrecûk'ê 37 km ber bi başûre. Ji Xelfetî û wêva rê naçe lê mirov bi kelek û motora li ser ava baraja kol i ser Ferat hatiye çêkirin dikare here.

Mixabin piştî avakirina baraja Bîrecûk'ê piranîya qezayê di bin avê de maye. Jo bo vê yekêjî nûfûsa bajêr li dora 2500 îye.

Dema bi motorê li ser Ferat digerî bajêr û Ferat bi dîrokêki kevn xwe temam dike.

Xaniyên bajêr yên dîrokî hemû ji kevir hatine çêkirin.

Le serîya çem cîyê ko keça Qralê demê hatiye heps kirin heye.

Di zindande gelek şokeft hene. Dîyare di dewrên kevnda xelk di van şikeftanda dijiyan.

Xalfetiya kevn li ser zinara bi dirêjahîya Ferat ra hatibû avakirin.

Kel : Kela wê li ser zinarên Qerexê çem û bi zinarva sifir hatiye avakirin. Ev kel ji avê 400-500 metre bilin avabûbû, lê piştî avakirina barajê, av zêde bilind bûye û rêya kelê di bin avEde maye. Ne tenê kel, gelek cîyên dinjî mirov nikare here nav.

Ne yên jor, nejîyên binê avê. Ji berhemên dîroki, mizgeft, dêr, qesr, minare, medrese zor xanîyên qedîm û şikeft di bin avêdane.

Di Xalfetîya nûda, gelek xanîyên nûjer avabûne. Li jenarê Ferat ji, cîyên geşt û seyranê, park, baxçe û şelale ji hene.

Hemû qerex bi elektrîk hatiye xemilandin. Li deverê gundî nok, nîsk, genim, ceh diçînin û karên zîraî dikin.

RIHA :

Bîrecûk û Xalfetî her çiqas li ser xetta Ferat'in jî, ji bilî wan Riha, Herran û Wêranşehir jî di vê herema Ferat'dane.

KEL Û ŞÛRHE :

Riha bi gelek tiştên xwe bi nav û deng e. Kel û Sûr'a Riha berhemên zor giringin. Kel li ser zinarekî bilind û asê avabûye. Li ser kelê dû stûnên mezin û bilind hene. Tê gotin ku wek menceniq hatine avakirin. Sûr piştî zayînî di salên 812 û 814 ande hatîye nûkirin. Lê sûr di bingeha xwe da berîya zayînî ava bûye.

XELÎLUREHMAN Û KULLIYE :

Di bin kelê de golekî bi navê Xelîlurrehman heye. Di golê da gelek masî hene. Tê gotin hikimdarê demê Nemrûd û Hz. Îbrahîm ji ber

hin gengeşîyên nav xwe li hev kirine û N3mrûd Hz. Îbrahîm bi mencenîqên serê kelê Îbrahîm avêtiye xwar. Li xwarêjî agrê fdaran hatibû geşkirin. Dema şbrahî dikeve nav agir, dar dibin masî, pêtîjî dibe av û Îbrahîm naşewite. Masî û ev mekan pîroz dihê dizanîn. Paşî li dora vê golê kullîyekî û mizgeftekî dihê avakirin. Nave wav Rizwanîye'ye. Di sala 1716 ande Rizwan paşa avakiriye. Sê rexên hewşa mizgeftê menzelên qutabîyane. Le ser mizgeft û kullîye qub hene. Qubbeyên ser wan hemû ji kevirin. Li başûrê golê minare çargoşe ye û balkêşe. Li çar alîyê serê wê pencere hene.

Kevirên avahîyan hemû hatine nexşandin. Li ser stûnanjî tim kember hene. Kemberji bi mîmarîkî kevanî hatine rûniştin.

JIYANA ROJANE :

Binê Kelê û der û dorên gol û kullîyê hemû bi darin. Bi gul û çîçekan hatiye xemilandin. Ev der tu carî ji mirovan xalînabe. Ji berk o xweştirîn cîyê bajêre.

Hin avahîyîyên nû, ko bi mîmarîya xwezayî hatine avakirin hene. Lê ji avayî yên kevn dûrin.

EYNZELXA :

Golekî dinjî bi navê gola Eynzelxa heye. Di bin kelêdaye. Gola mezin û ev gol bi ergên mezin bi hevre hatine girêdan. Li ser gola Eynzelxa xelk dikare bi keleka bigere.

Kuçên bajarê kevn tengin. Kuçe bi keviran hatine raxistin.

Dema ji serê kelê temaşa bajêr dihê kirin, bajêr têr xweş dixwiye. Xanîyên kevir bala mirov dikêşin. Di bin kelêda mizgeftkî nûjî ava bûye. Lê mixabin ev mizgeft mîmarîya deverê xerabkiriye.

XANÊN BAJÊR :

Di nav bajêr de gelek xanên mezin hene. Wek cîyên komedihkan dihênn bi karhanîn. Xelk bazirganîyê di van xanan de dike. Ziv, tişt û lîbasên xeml û rewşe, titûn, îsot, cil, şal û tiştên din dihên firotan. Gelek ji wanjî berhemên destane.

Di jiyana şevêde dema ko mirov temaşa kel û Kulliya rohnîkîri dike, bajar nayê tarif kirin.

Bajar bi nufusa xwe 400 hezare. Jiyan geşe. Bazirganîjî geşe. Di nav bajêr de em diçin nav xanekî. Navê xanê xana Gumr'êye.